

**Eskerê BOYÏK**  
[e.boyik@web.de](mailto:e.boyik@web.de)

## ÊZDIYATÎ GEREKÊ BIVE WARÊ ZANESTYÊ

Kurdên Êzdî jî wak bawarmendên dînekî kevnar xweyê dîrok, e'rf-e'det, e'yd-e'refat û u'lmê xudênasyeyî dewlemendin. Tiştên usan li nava Êzdiya da mane ku koka wan ji kûraya hezar salan tê. Bi zanyarî lêkolînkirina wan, kare ronayîke zanyarî bavêje ser gelek pîrsgirêkên gelên Mêzopotanya dîrokî...

Mixabin, ji rûyê der-dorên olperest e fanatîk, zulm û zora der û hundur, dîndijminatya reş, Êzdiyan heta vê de'wyê jî nikaribûye rê û rizmên xwe aza derbaskin, rastya ola xwe eşkere dîharkin. Her tişt ker, bi cûrekî sergirtî, bi tirs-xof hatye kirin, rastya bawarya xwe kesî ra negotine. Dîroka wan di nav te'rya tirsê û bin kelefên fermanên xûnrêj da maye. Ji bo wê jî ev dîne qedîm dinyayê da rind nehatye naskirin û cîyê xwe yê layîq li rex olên din negirtye. Berovajî, der-doran gelek tiştên nerast, şer û şiltax Êzdîtyê va girê dane û li dinyayê belev kirine.

Bi texmîna min, êdî ew dem derbaz bûne, ku seva bawaryê fermanan Êzdiyan rakin, yanê jî astengyê ji bo hebandinê û derbazkirina rê-rimzên olî ji wan ra çêkin. Êzdî êdî karin pîrî hindikî pîrsgirêkên xwe bi xwe çareserkin, e'rf-e'det, e'yd-e'refatê xwe serbest pêk bînin, derheqa kevnarî, xwedênasî û hûmanîzma ola xwe da aza biaxivin, binivîsin û netirsin. Qewata Êzdiyan ya zanyaryê jî pîrî hindikî heye, gelê kurd jî êdî koka xwe xweyi derdikeve. Dimîne ew kar bi zanyarî û bi rêk û pêk bê meşandin.

Ji pey xezeva dewranaye zulm, bihara xêrê êzdîtyê vebye. Te'rya tirs û xofê ya hezara salan ji ser wî heykelê zanyarya mervyeyî qedîm hatye hildan. Tiştê nivîsarê pirin û niha jî bûye mode destê kê qelemê digre dinivîse. Salê li ser êzdîtyatê gelek pirtûk derdikevin, çend kovar tînen weşandin, malperên întêrnêtê pirrin.

Pêvajoya wa çiqas xêre ewqas jî xirave.

Kê çî dinivîse, çawa dinivîse, êdî ez derheqa nezanya zimên da navêjim, medyayê da usa jî tê belavkirin, xema kesî nîne raste, şaşê, ji alyê civakê va tê qebûlkirin, nayê qebûlkirin?

Him serokatya Êzdiyan, him jî meclîsa wê ya ruhanî bêtaqetî wî karî rêva bivin, merkezeke zanyarî nîne, pêşya wan çewtyan bigre, payê oldarên Êzdiyan, yê pirê jî, ku haj ayîna dîn hene, nexwendî ne. Nizanin çî lîstik ser bawarya wan tê kirin.

Ûsane zanestya bawarya êzdîtyatê jî ji alyê merkezeke zanestî va gerekê bê rêvabirin, nehêlin xeletî û nezani hêlîna xwe tê da wî vîyê pîroz da daynin, bawarya suruştîye wek ava kanyên zelal bi şik û derewan şêlûkin.

Êzdîtî dîneke, zanyarya bawarîkê ye, seva kîjanê bi dewrana weke çemê Diclê û Firatê xûna evdên Êzdi herikye û niha jî pey ewqas qir-bir, ferman zor û zemetya ra, bawarkî, milyonek bawarmend pey wê bawaryê diçin. Ew usa jî heykelekî kevnarî dîroka mirvayê ye, usa nîne serê kêra çî derbaz be, derheqa vê bawaryê da binivîse.

Vê demê fikirên **yekkirina êzdîtyê û zerdeştîyê**, ji bingeha **kurdîtyê qetandina Êzdiyatîyê**, hinek fikirên çewte derheqa şexsyetên Xas û Babçekên vê bawaryê da, ku li nav civaka Êzdiya da nayên qebûlkirin gelekî tînen nivîsar, girtûgohkirin. Çiqas jî, Êzdî dizîva yan eşkere, ji wan fikiran a'cizin, dîsa ew fikirana tînen wekilandin.

Eva bawarkî 30-40 sal e pîrsa yekkirina Zerdeştîyê û Êzdîtyê rojava medya Kurda dernayê.

Em rind zanin ku hineka bi zanyarî û bi zorê ew fikir kirne rojavê û çiqas jî xeletyên wê fikirê derdikevne ber çavan dîsa hinek ,, nivîskar,, dinivîsin, ha dinivîsin.

Zerdeştî bawarîke Rojhilatê ye, oleke kevnar e pîroz e, ji pey xwe heykelên dîrokî yên giranbhave zêrin hîştine. Kitêba pîroz Avêsta maye... Ev hemû cîyê şahnazî û qimetên bilinin. Lê dîsa ne civaka Êzdyan, ne jî Zerdeştî vê fikirê qebûl nakin.

Ez oldar nînim naxwezim bikevme kûraya pîrsgirêkê, lê min di nav wê civakê da jîyana xwe derbaz kirye û tucar ji tu oldarî, tu mezinekî êzdiyan navê Zerdeşt, navê Avêstayê û ew navên Avêstayê da têne gotin nebihîstye. Çiqas ez bi têkstên ola Êzdiyan ra nasim dîsa tu cîyan navên jorgotî nayên bîranîn...Erê, gelek tişt di nav herd ola da mîna hevîn, lê cudatî xalên bingehîn da nin.

Pîrsa din, ku civaka Êzdiyan pê dêşe , dîsa hinek nivîskar û lêkolînavên eslê xwe va Êzdî û ne Êzdî, hîmbûyî li ser hinek melûmetyên dîrokî şexsyeta Şîxadî Ereba û musulmanyê va girê didin. Eva bi rû va tê bêjî pîrsgirêk nîne ji bo Şîxadî jîyana xwe ya zanyaryêye herî gulvedanê da, bi rezadilî hatye nav Êzdiyan, bawarya xweTawisî Melek anye û bûye rêberêkî wê olêyî herî mezin, sîmvola êzdiyatî... Lê bin wê zelalyê da sirreke sergirtî veşartîye, rehê kîjanê ji dîrokê tîn. Ku bêjin şexsyetekî musulman hîmê vê bawaryê danye, usane Êzdîtî oleke serbixwe, bawarîke kevn nîne şewekî musulmanyê ye...

Ya ewlin gerekê bê zanîn çevkanyên wan melûmetîyan ji ku tîn, çine... Ew ji nav ulmê dînê êzdiyan, bîranîna vê civakê tîn yan ji nivîsarên xêrnexwezên vê bawaryê da hene? Eyane ewê ew melûmetî pey xwe hîştine hîmlî nexwez û neyarê êzdyatyê bûne, oldare ereba bûne, meremê wanî hîmlî ew bûye, bi çi cûreyî dibe bira bibe, gelên wê heremê nav cihana Ereba da bihelînin. Wê demê êzdyatî jî Kurdistanê da li ser rêya wan kelemekî herî mezin û sert bûye. Usane her nivîsarên ku ser Êzdiyan û êzdyatyê hatine nivîsar gerekê wek “rûnê helandî ,, neyên qebûlkirin. Gotî bi şik û zanyarî nêzîkî wan çevkanyan bibin.

Ji lêkolînkirina nivîsarên derheqa Şîxadî û ulmê êzdiyatî ez hatime ser wê bawaryê, ku Şîxadî şexsyetekî Kurdî dîrokî, bi koka xwe va Êzdî bûye.

Dinivîsin, ku Şîxadî li gindekî Libinanê Betfar (kurmancî Kune Mişk) hatye dinyayê, xortanya xwe da çûye Bexdayê, li cem zane û filîsofên bi nav û deng xwendye, wek zanyar, xwedênas, dewrêşe helbestvanekî wê demêyî mezin hatye naskirin paşê vegeryaye Şamê û paşê hatye Hekarye nav Êzdiyan, usane, dinivîsin, ereb e û musulman e... Vira pîrs pêşda tê çima hatye Şamê û ji wura jî nav Êzdiyan? Bi texmîna min nêzîkî rastyê ye ku wê demê Şamê da yan nêzîkî Şamê civakeke Êzdiyaye mezin hebûye, Betfar jî ku pîr dîrî Şamê nîne gundekî Êzdiyên koçber bûye. Şîxadî wek dewrêş, filîsof û şexsyetekî naskirî, bi bîr bawaryê êzdîtayê vegeryaye nav civaka xwe û ne tenê, tevî komek qewm û hevalbendên xwe diçe Hekarye li nav kûraya Êzdiyan. Xuyaye wê demê lîstik û xeterên mezin li nav dorpêça nexweza da, li ser vê civakê û vî dînî hebûne. Şîxadî haj wan hemya hebûye. Wekî dijî wan lîstik û xeteran bigre, hed û seda ku berê da fikirî bye, li nav Êzdya da datîne. Ew hed û sed usa bi aqilî û hostatî hatine danîn ku eva devedevî 8-9 sedsalan e bûye sûreke pola dora êzdiyatî û heta îro jî dijî zor û zulma xêrnexwezan vê civakê diparêze.

Eger Şîxadî Ereba bûya, ewyê kurmancî (zimanê Êzdiya) nizanbûya, tucar wî û Êzdyan ji hev fem nedikirin û hev qebûl nedikirin. Eger Şîxadî musulman bûya, wê biçûya li nav musulmana hîmê terîqetê nû danya, çawa hinek hevalên wî kirin, paşê jî bi qanûnê îslamê evdê musulman ku ji ola xwe dertê, yan lê dîr dikeve qetla wî helale. Di wê dewrana olperestya hişk da kuştina evdekî wek Şîxadî musulmanyê ra dijwer nî bû. Lê ji dîrokê xuyaye Şîxadî derengya kaltya xwe, bi emrê Xwedê kiras guhertye. Navbera wî û gelek şexsyetên musulmanyê yên bi nav û deng pîr xweş bûye, gelek Şêxên musulmanan ku sîr û kiriyametên wî bivînin hatine Lalişê mêvanya wî.

Rojhilatzanyê da û evdên bawaryê din ra Şîxadî wek şexsyetekî dîrokî ye ,weke gelek şexsyetên din.

Rastyê Şîxadî, şexsyeta Şîxadî tek Kurdên êzdî ra pêwîste, ji bo bi dewrana ew ne ku tenê wan ra sîmvola hebandinê bûye lê ew gîhandine asta meleka û Xwedê. Ew kirine ala here jorîn û pey çûne. Usane, wê bawaryê bi fikirên bê hîm û ne cîda nava evdên Êzdî da gerekê nekine bin şikê. Pêwîste, zanyarya êzdînyê bîranînên civaka Êzdî derheqa Şîxadî da ,tev

ulmê bawarya êzdîtyê bikine hîm, bi melûmetyê dîrokîyî yê nêzîkî aqila, şexsyeta Şîxadî binirxînin, ku şîkê dilê bawarmenda da pêşda neynin û dewya wan bi fikirên nerast sexte neyê şîkênandin.

Niha pîrsgîrêkeke êzdîtyê ya gelekî êş û pîroblêm, ku bûye sebebê bêtfaqyê û jihev femnekirinê ew **pirsa gelo Êzdî Kurdî yan na...** Ev rastya bê şîk e kurdeyatya Êzdiyan timê demên dîrokî, ku gelê Kurd bi tifaqê, yekîtyê kare pîrs û pîroblêmên xwe çareserke, neyarên kurdan vê pîrsê tînine meydanê.

Bi texmîna me dewya salên heyştêyî, sedsala çûyî, heta niha tu tiştî ewqas zirar nedaye civaka Êzdiyên, tifaq û yekîtya wan çiqas pîrsgîrêka Êzdîtyê-Kurdîtyê. Bi wê dubendyê mala Êzdyên Ermenistanê xirav bû. Niha jî li nav Êzdyên Şengalê da hinek bi vêdütîretyê bextê Êzdîxanê ra dilîzin.

Eger serokatya Êzdiyan, hinek zanyarên naskirîva, hevki bi dilêşî nêzîkî vê sextekarê bûna, bixwestana, karibûn zû dewyî vê dütîretyê banyana. Lê heta niha fikira wan e bi dil û rast derheqa vê pîrsê da min nebihîstye... Çima? Ez nizamim...

Niha dem hatye û mecal jî hene, ku êzdînyê wek beşekî kurdzanyê bê danîn li ser hîmê zanestya esil. Ne ku kê rabe, çi fikir serê wî ra derbazbe (êdî ez derheqa nezanya zimên da nabêjim) bi texmîna xwe vê derheqê da binivîse, yan bi xêrnexwezyê û neyartyê dütîretyê bike nav gelê Kurd, nivîsar gerekê encamên lêkolînên zanestî bin û bivin hevîrê tifaq û yekîtyê. Gerekê rê nezanyê, listikên xêrnexwezan bê girtin.

**Derheqa vê fikirê da wedeye hukumata Kurdistanê Başûr, serokatya Korî Zanyarî Kurdistanê, Merkez Laliş (Dihok), serokatya Êzdiyan (civakî û ruhanî), Komelên Êzdiyan yê Ewropayê û Rûsyayê bifikirin. Wedeye merkezeke ÊZDÎNASYÊ ya rêk û pêk bê demezirandin.**

07. 03. 2006